

Deng û Tîp

Memê Alan

Bi Kurtî, di zimanzaniyê de, deng weha şirove dibe; Ew bayê ku ji pişka mirov derdikeve, diçe qirikê, û li wir bizavekê dide, û paşê ew deng bi alîkariya qirik, lêv diran, ziman, ezmandev, û difina mirov durveke taybet distîne. Deng bi xwe jî du bir in: Birik jê bi awakî yekser, rasterast û bê sekin ji devê mirov derdikeve, ji wan re bideng tê gotin, lê, yên bédeng, nikarin bê alîkariya bidengan û bi serê xwe, ji devê mirov derkevin. Yanê, ta ku miriv wan bi lêv bike pêdivî bi bidengekê heye. Di zimanê Kurdî de, 31 dengên bingehîn hene. Ji wan 23 deng bédeng in, û 8 bideng in. Lê hêjaye were gotin, ku hinek deng hene jî jê re rengedeng tê gotin, yanê pirdeng in.

Tîp jî nîşandekên dangan in, yanê bi alîkariya wan dangan têne nimandin. Herwekî berê me xuyakiribû, ku zarava Kurmancî ji 31 dengên bingehîn pêk tê, li nik wan dangan jî, 31 tîpên bingehîn têne nîşandan. Lê gelek rengedengên dî, mîna Ç, T, P, K, L, R, N û dengên (ع), (ح) û (Ğ) yên ji zimanê erebî derbasî Kurdî bûne û nêzîk wan dengên Kurdî mîna (H, X), hîn şirovekirin li ser wan berdewam e, û lihevkerinek giştî pêk nehatiye.

Yanê di Kurdî de hinek deng hene- tevî ku abeya Kurdî wekî abeyeke fonotîk e (ji bo her dengekî tîpeke) – ji wan re tîp diyar nebûne. C. Bedirxan, ew deng weke rengdeng dîtine û tu nîşan jê re diyar nekirine. Hêjaye em bibêjin, wê hingê apê Osman Sebrî li dijî wî derket û du niçik danîn ser ên nerm, bi wî şeweyî ew rengedeng dan nîşandan û tîpên Kurdî zêde kirin. Niha jî hine kes dixwazin bi awakî van di nava abeya Kurdî de bi cî bikin.

Di vê xebatê de, emê dibînin ku rêça C. B qelaştî emî bigirin û hîmê wî daniye em

hilnaweşînin, ta ka saziyeke hevgirtî ya Zimanê Kurdî pêk were, û lihevkerineke giştî çêbibe. Ji ber ku em rê nadin heryekî ku bixwaze li ser navê serastkirinê û di bin navê lîkolîneriyê de pihînekê li wê avahiya zimên ya dîrokî de. Li alîkî din jî herkesek hewldide ku hejmara tîpên xwe kêm bike, û abeya xwe hêsan û sivik bike, vêja pêwîste em jî li ser şopa hêskirinê bimeşin. Û ji ber ku di Kurmancî de, dengdar li gor cihdera dangan, şeweya derketinê, û asta derketina wê ji hev vediqetin. Di baweriya me de divê rengedengên me bi navkirine di abeya Kurdî de, bi tîpan neyêne nîşandan. Tenê di perwerdehî û lêkolînê de mirov dikare wan bi awakî ji awan nîşan bide. Bi dîtina me be, nîşandana wan rengedengan bi tîpine din cuda ji yên berê ji bo zimanê me bargiranî ye. Lê hêjaye em bêjin ku ta niha, tu lêkolînên zimanzanî yên fereh û kûr di dermafê zimanê me de tune ne. Tiştêkî neguhêrek tune ye, û zimanê me jî yek ji wan tiştên guhêrek e. Wêlomê pêşketina wê jî bi hewceyî lêkolîn û nêrînên zanistî ye. Lê çi biryarên guherînê di paşerojê de, di zimên de çêbibin bi hewceyî lihevkerinên giştî û biryarên saziyên zimanewî ne.

Pîroz be

Piştî 73 roja n ji binçavkirinê, roja Çarşemê 17-6-2009 an, Rojnemevanê Kurd Faroq Hecî Mistefa ji zîndanê serbest hate berdan.



Daristan Sermiyan e

Hêvî ew e ku haya xelkê me ji şewtandina daristan û zeviyên hebe. Wêlomê avêtina dûvikên cixaran û pêxistina agir li seyranan bi awayekî ne miqiyat ziyane digihînin vê sermiyanê.